

Bidestveanîna Mafênet
Netewî
Yên Gelê Kurd Di
Çarçoveya
Îranek Demokratik û
Federal De

Hejmar: 198
19'ê Çileya Paşîn a 2013'an
Buha: 150 Tûmen

Agirî

Pîroz be 2'ê Rêbendanê salvegera avakirina
Komara Kurdistanê

2'ê Rêbendanê roja avakirina yekemin Komara
Kurdistanê ji aliye hezretê pêşewa Qazî Mihemed ve
ye. Ew komara ku li zivistana sarr ya sala 1324'ê de,
lê bi dilek pirr germ û pirr hêvî û bi axavtina
Pêşewayê Kurdan hate ragehandin. Em vê roja pirr
dîrokî ji tewaya Kurdan pîroz dîkin û hêvîdarin ku
rojekê em dîsan bibne xwediyê komarek weha li
Kurdistanek azad û demokratik de.

Desteya weşana duheftînameya Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û giştî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistanê Iranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdî

R:3

Serkomarê Kurdistanê

Turkiye li pey hevalan
digere

R:7

Tarîperest ji ronahiyê
tirsîyan...

R:11

Zimanê doh, îro û sibê

Doh
Viyen
û
Birlîn,
û îro jî



Parîs
bi
xwîna
Kurdan
sor
bû

Şoreşgerêñ Kurd di landika demokrasiyê de bûne armanca gulleyan

Li Parîsê di encama êrîşeke çekdarî yek ji damezrênerê PKK'ê Sakîne Cansiz û nûnera KNK'ê ya Parîsê Fîdan Doxan û jina ciwan a bi navê Leyla Soylemez terorkirin.

Li gorî zanyariyan di vê êrîşê de çekan bêdengker hatibûn bikaranîn, û gulle li serê Cansiz

û Doxan, û li zikê Soylemez ketibûn. Polîsên Fransî li cihê bûyerê dest bi lêkolînan kîrin.

Piştî bilavbûna vê bûyera dilsoj gelê Kurd bi tewaya partî, rêkxîraw û nawendêniyê siyasî û medenî ve ew teror bi tundî şermezár kîrin, û herweha meşeke berfireh li bajarê Parîsê

de pêk anîn. Dema ku termê wan şehîdan birne bajarê Diyarbekir, li wir jî gelê Kurd bi coşek bê mînak ve tevlî rêuresma pêşwazîkirina ji şehîdên xwe bûn û roja paştir jî her sê şehîd ber bi cihê ku malabatê wan lê dijîn birin, û ew bi hurmetekî bê mînak ve bi axê sipartin, û di vê roja xembar de malbatê wan bi tenê nehêlan. PDKî jî di daxuyaniyekê de ku di rûpela 2'ê de hatiye weşandin ew teror bi tundî protesto kir.

Birêz Xalid Ezîzî serdana Deftera Siyasî ya PDKî kir



Heyeteke hevalêñ pêşîn bi serperestiya rîzdar xalid Ezîzî serdana Deftera Siyasiya PDK Îranê kir.

Li gor rapora malpera Kurdistanmedia, roja pêncsemîyê 17'ê Çileya Paşîn a 2013'an heyeteke Partiya Demokrat a Kurdistanê Iranê bi serperstiya Rîzdar Mistefa Hicrî pêşwazî ji heyeta hevalêñ pêşîn kir.

Di dirêjahiya dîtin û çavpêkavtina pêştir de

baseka siyasî li ser rewşa Rojhelata Navîn, pîrsên pêywendîdar bi tevgera mafxwziya gelê Kurd bi giştî, xebat û tekoşîna gelê Kurd li pêxema bidestveanîna mafênet siyasî û netewî de kîrin. Di vê civînê de li ser berdewambûna xebata azadîxwaziya xelkê Sûriyê û gelê Kurd di vî welatî de bi mebesta rûxana rejîma Dîktator a Beşar Esed û partiya Be's a Sûriyê, baseka siyasî hat kîrin û bi vê encamê gehîştin ku piştî rûxana vê rejîmê rewşa siyasî ya Kurd, dê baştir be û gelê Kurd bi nehêlana astengiyêñ li ser rîya xebata xwe...

Dom R:2

Bazirganekî Kurd li Moskoyê hate terorkirin

Rojnameya "Corriere della Sera" a ïtalî ragehand ku, pê diçe terorkirina "Eslan Osoyan" naskirî bi "Bapîr Hesen" kesatiyê bi nav û deng di bazirganîkirina çek û teqemeniyan de, pêwendî bi terora sê çalakêñ jin ên Kurd li Parîsê ve hebe.

Rojnama navbirî terora Bapîr Hesen hevşêweya terora sê çalakêñ jin li Parîsê nîşan



Salih Kerîmyan:

Eva 24 sal e ku min jin û zarokêñ xwe nedîtine, û ji wan dûr im, lewra hêvî dikim ku rojekê vegekim welat û bi azadî bi wan re...

PDKî di konfransa pirsa kurd de beşdarî kir



Di roja 24 û 25'ê Befranbara sala 1391'an de, Luqman Ehmedî endamê

komîteya nawendî û berpirsê peywendiyêñ derve ên PDKî, beşdarî di konfiransa pirsa Kurdên çar parçên Kurdistanê li bajarê Duheyê de kir.

Ev konfransa han ji aliye sentera lêkolîna Elcezayêr û sentera lêkolîna sitratijî a ïraqê pêk hatibû.

Di roja yekemîn a konfiransê de, di du panêlîn cuda de, pirsa Kurd li ïraq û Sûriyê û herweha pêvajoya guhertin û xwastekênetewa Kurd di wan welatan de ket ber bas û, di roja dûyemîn de jî pirsa Kurd li welatên Turkiye û Iranê xistin ber bas.

Dom R:2



R:9

Daxuyaniya PDK Îranê derheq terorkirina sê çalakên siyasî ên Kurd li bajarê Parîsa Firansayê de



Li gorî wan nûçeyen ku ji Parîsê bilav bûne, şeva Çarşemiyê 20'ê Befranbara 1391'an a Rojî



(09.01.2013) sê xûşkêñ Kurd bi navêñ Sakîn Cansêz, Fîdan Doxan û Leyla êrîseke terorîstî, û bi Soylemez, kurdêñ Kurdistana Turkiyê gulleyan canê wan jê hate ku xwedîyê rabihuriya tekoşîna siyasî û hate sitandin û sibêdehiya mafxwaziyê bûn, li bajarê Parîsa roja pêncşemiyê 21'ê paytextê Firansayê bûne armanca Befranbarê

qurbaniyêñ vê terorê hate dîtin. Deftera Siyasî ya PDKî tevî şermezarkirina vê kiryara terorîstî nerehetiya xwe termê

Hejmar 198, 19'ê Çileya Paşîn a 2013

derheq vê bûyera dilêş radigehîne û hevderdiyê di gel malbat û kes û kar û hevalêñ wan qurbaniyan dike, û hêvîdare ku Wezareta Navxwe û demûdezgehîn têkildar ên Polîsê Firansayê her wek ragehandine, bi awayekî micid şûnpiyê terorîstan hilgirin û wan radestî dadgehê bikin û wan bi bîrûraya giştî a cîhanê bidin nasandin.

**PDK Îran
Deftera Siyasî**
22.10.1391
11.01.2013

Sergotar

Parîs Hejiya

Şehab Xalidî

PDK Îranê yek ji wan partîyan e ku li gorî wan pirensîpêñ ku li ser hatiye ava kirin, baweriyeke tewaw bi parastina mafêñ mirovan û mifahwergirtina ji riyên însanî û astîxwazane bo gihîştina bi armancêñ xwe heye, û qet dest bo teror û tundûtîjiyê nebiriye, lê mixabin bixwe gellek caran bûye qurbaniyê terorê, ku terora herî bi êş û jan terorkirina Dr. Qasimlo û hevalêñ wî li Viyenê, û Dr. Şerefkendî û hevalêñ wî li Birlînê de bû.

Lê ya ku cihê şanaziyê ye ew e ku vê partiyê qet li hember wan terorîstan de dest bo teror û tundûtîjiyê nebiriye û her gotiye astî, astî, astî. Mixabin terorêñ li dervayî welat bi vê hindê jî bidawî nehatin û çend rojan berî niha mixabin sê jinêñ şoresger, sê kolîkîn azadsiyê bûne emanca gulleyen qirêj ên terorîstan û hatin şehîdkirin, û tevlî karwanê sorxelat ê şehîdêñ Kurdistana bûn. Vê terorê êşek giran danî ser dilê her kurdekî û her kurdek xembar û tazîdar kir.

Terorîstan viyan ku bi vê terorê peyamekê bidin, û peyama wan jî ew bû ku heke hûn bixwazin astiyê di gel neyarêñ xwe bikin bona gihîştina bi armancêñ xwe, eva bizanin ku em li pêşîya we asteng in. Gelo di rewşek weha de divêt em ci bikin?. Bê guman gelê Kurd jî bona pûckirina wan pîlanan tenê û tenê hewcehî bi moralekbihêz, û yekîtiyek netewî heye. Ew yekîtiya netewî dikare terorîstan serşor û bêhêvî bike, û pozê wan li erdê bimale.

Doma nûçeya "Xalid Ezizî serdana Deftera Siyasî a PDKî kir"

wê bigîjin mafêñ siyasî û netewî di çarçîva sîstimeke nû a welatê Sûriyê de.

Her di vê pêywendiyê de bas ji bi pirsa Kurd û gotûbêjîn serkidayetiya tevgera gelê Kurd li Kurdistana Turkiyê de li gel weletê Turkiyê hat kirin û ev piroseye, bi rîya çareseriya erêni ya pirsa Kurd di vîwelatî de hat zanîn, û her du alî li ser vê baweriye bûn ku mifahwergirtin ji rewşa siyasî ya li Turkiyê de dikare çareseriya vê meselê zûtir bike, û pîlana neyarêñ aşitiyê lawaz bike.

Di dirêjahiya vê bas û gotûbêjî de, rewşa aloziya Îraq, rikeberiyêñ siyasî û olî

yên Ereban di vî welatî de, çareser nekirina pirsa Kurd, weke mada 140'a destûra Îraqê û mesela deverên Kurdistanî yên Herêmê li gel Dewleta Nawendî hat bas kirin û di vê pêywendiyê de siyaset û helwêsta serokayetiya Herêma Kurdistanê û dirêjîdana bi diyalogê li gel dewleta Îraqê wek siyastek waqiebinane hat nirxandin, û li ser vê baweriye bûn ku encama vê siyasetê cih û bingeha Kurd li Herêma Kurdistanê de berev pêşve dibe.

Xalek din a serekî ya vê rûniştinê bas li ser rewşa siyasî a Îranê û Kurdistana Îranê û wan kirîzan

bû ku rejîma İslâmî a yêne û siyaset serkût, zext û gîvaşa li ser belengazên Îranê, û berdewambûna mehandina Oraniyûmê û siyaset alîkarî kirin bi Terorîzmê û rejîmên Dîkîtator weke rejîma Be's a Sûriyê bû, ku ev rejîme pitir li asta navxweyî û navneteweyî, izole kiriye, û herweha zexta abûrî a ser rejîmê ji aliyê Civaka Navneteweyî ve, rejîm bê care û rewşa wê di ware aborî de aloz kiriye.

Her weha di vê civînê de bas ji vê hat kirin ku rewşa bûyerên siyasî û serhildanêñ cemawerî li hember rejîmên dîkîtator li halê geşekirinê de ye, û erkê hîzb û aliyêñ siyasî yêne Îranê û Kurdistanê ew e ku

pitir girîngî bi diyalogê bi armanca hevkarî li ser xalêñ hevbeş li hemberî rejîmê de bidin, û bi gotarekî hevbeş li mediyayan de siyaseta rejîmê pûç û bê bandor bikin, û li kor û kombûnan de beşdariyê bikin, û bi taybet ev çavnihêriya civaka xelkê Kuristanê û gelên azadîxwaz ê Îranê li tekoşîna me hene, em bi cî bînîn, û peyrewiyê ji siyasetekê bikin ku pitir derfetê bo hevkarî û hemahengiya hêzêñ siyasî ên Kurdistana Îranê pêk bîne.

Ew civîn li rewş û hewayeke dostane de bidawî hat û li ser dirêjedana bi kombûnan û geşekirinâ li ser pîrsen girîng siyasî yêne Îranê û Kurdistanê ew e ku

Doma nûçeya: "PDKî di konferansa pirsa Kurd de..."

Di panêla taybet bi nûnerêñ PDKî ku biçin pirsa Kurd di Îranê de, parlementê, şerek Luqman Ehmedî bi hovane bi ser netewa nûneratiya PDKî, di Kurd de sepand". despêkê de basek li ser Ehmedî di doma xebata gelê Kurd û PDKî gotinêñ xwe de pêşkêşî besdaran kir. ragehand: "PDKî Piştî Ehmedî got: "Di hemû hewlêñ xwe yekemîn hilbijartina xistin kar ku pirsa parlementa Komara kurd bi awayek İslâmî de 60 heta %80 siyasiyane bê ji dengêñ besek berçav çareserkirin, lê ji xelkê Kurdistana bi Komara İslâmî tenê bi destve anîn, lê rejîma riya tund û tîjî û taze avabûyî a Îranê, di kuştin û terorê cihê vê de ku rîe bersiva tevgera

demokratîk a gelê tepeserkirina Kurd da. Bo mînak li netewêñ Kurd, Ereb, ser maseya Belûç, Turkêñ Azerî danûsitandinê rîberê û Turkmenan kire gelê Kurd Dr. Qasimlo bingeha siyaseta û bi dehan hezar kes xwe û di hember vê ji xelkê medenî û siyaseta Komara çalakêñ siyasî ên İslâmî jî de, wan Kurd Kuştine. neteweyan jî Navbirî pêdagirî li Kongireya netewêñ ser vê rastiyê kir ku Îrana Federal ava Komara İslâmî a kirin da ku xebat li Îranê êdî siyaseta pêxema nevxwe û derive ya damezirandina xwe, li ser bingeha sistemek Federal û nemana xwe demokratîk bi awayê lewra darêtiye, siyaseta herî baş birêve bibin".

Serkomarê Kurdistanê



Soran Kerbasyan



Dewleta Komara Kurdistanê ku li ser îrade û vîna piraniya êlît û nûnerên neteweya Kurd li gorî rewşa wê demê hate ragehandin, wek wêneya herî ciwan ya şoreşen siyasî ên neteweya Kurd tê hesibandin. Ew ragehandina jî hewcehî bi komek faktêrên giring wek pêşîneya xwestekên neteweya Kurd, nebûna çi dilxweşiyekê ji welatên hakim bi ser Kurdistanê de, êlît û rewşenbîr, serkirdeyên hişyar û karîzmatîk pêk hat. Hewce ye ku li ser her yek ji wan faktêrên giring şirove û lêkdanewe bihê kirin ta ku em bikarin wêneyê gellek nêzîk ji dîroka rastîn a Komarê saz bikin. Li wir de hewil tê dan ku havrûyek ji serokatiya Komara Kurdistanê bê dan û pêdaçûnek bi ser mijarê din de emê bo demekî din bihêlin.

Navê serkomarê Kurdistan ku pitir wek navên Qazîmihemed û Pêşewa nav dîbin, "Mihemed Himam Qazî" bûye. Rewan şad "Mîrza Xelîl Fetah Qazî" ku pirtûka dîroka malbata Qazî ji rûyê bîreweriyê wî ve hatiye çapkirin, li vê derheqê de gotibû: "xwedê jê razî Mîrza Elî Qazî du kur hebûn, yek Mîrza Mihamed Homamê wQazî, ku paştir wek Qazî Mihamed hate nasîn, ê duyê jî Ebûqasimê Sedrê Qazî".

Pêşewayê Kurdan yekemîn çalakiya siyasî a xwe bi awayek fermî di demekê de dest pêkir ku piştî daxwaziyek zor ji aliyê nîştimanperwer û êlîten Kurd qebûl kir ku serokatiya Komeleya Jiyaneweya Kurd bi destve bigre.

Di dawiyê de jî ku PDK Îranê li ser hemen vê bingeha rêxistinî a Komeleya J - k, li salvegera avakirina v; komeley;de hate ragehandin, wek serokê PDKî hate hilbijartin. Li rewşek hejî de piştî nirxandina hemû alî û hewcehiyeke dîrokî ew partî

wek yekem partiya modern a Kurd şiya ku bi alfâriya sercem wan Kurdênu ku dikarîn besdar bin, dewleta Komara Kurdistanê ragehînin û cenabê pêşewa jî ku li vê serdemê de, altînatîva herî baş bo Kurdan bû, wek serkomar hate hilbijartîn.

Pêşewayê Kurdan ku li malbatek zana û xwedîhurmet de mezin bibû, lê ew yek sedema sereke bo hilbijartina wî wek serkomar nebûn. Belkû kesayetiya taybetî a wî û jêhatîbûna wî cemawer han dida da ku wî wek serokê xwe hilbijêrin.

Yek ji erkêن serok hişyarkirina civakê ye, moralek bihêz hebe û li ber bi pêşvebirina bernameyê xwe de bi ser kêşeyan de zal be, û li pêxema berjewendiya giştî da tev bigere. Cenabê Pêşewa her wek belgeyê serdemê Komara Kurdistanê piştrast dîkin, berdewam ji riya qisekirin û birêvebirina kombûnan hewla hişyarkirina cemawer dida. Wî bi nirxandineke durus kesayetî bona piraktîze kirina bernameyê xwe hildibijartîn ku li besen curbicur de vê yekê reng dida.

Serokek serkewtî li rewşek aloz de hewil dida ku kêmtrîn xisar li civakê bikeve. Li gorî belgeyan dema ku dirêjiya jiyanê bo Komara Kurdistanê nema, wî xwe kire qurbanê tewaya gelê xwe.

Wî ew yek qebûl nekir ku neteweya wî berpirsayetiyeke be ku bixwe ew yek qebûl kiribû.

Cenabê Pêşewa li axavtina herî cu bi wan re here, gotibû: "ez xelkê li nexweşîyan de bi tenê

Serkirdeyekî serkevtî her demê hewla yekbûnê dide, bawerî bi berjewendiya giştî a neteweya xwe heye, û li pêxema berpirsayetiya xwe de disekine û xwe winda naake. Axavtinê wî ku beşek berçav ji rojanameya Kurdistanê de hatine çapkirin, vê yekê piştrast dîkin ku Pêşewa herdemê bona qahîmkirina rihê yekbûnê, di nava hêzên Kurd de di nav tekoşînê de bû.

Serok hewce ye ku hezkirî be, û li ser bingeha pileya serwet û samanê xwe bi ser civakê de nesepîne.

Gellek ji hejmarên rojnameya Kurdistanê xudîkek in ji evîn û hezkirina cemawerê kurd ji serkomarê Kurd. Dema ku em bala xwe didne rewşa çapemeniyan di vê serdemê, guman li vê de namîne ku hezkirina xelkê ji Pêşewa ne ji nrûyê tirsê belkû bi sedema demokrat bûna û jiyana navbirî bûye, û deshilata Komaraê bona sepandina boçûnên xwe bi ser xelkê de bi kar nedianîn. Komara Kurdistanê bi sedema dabînkirina garentiyekê bona bergirî ji nasnameya Kurdan û tenhaiya wan hatibû ragehandin, ne bi sedema berjewendeyîya malbatî yan takekesî.

Hunera serokatina cenabl Pêşewa li vê yekê de pitir reng dabû, ku reftarê wî hilgirê peyama şaristaniya neteweya wî bû. Deshilata serkomar ne bo têrkirina hewcehiyê wî pêk nehatibû, belkû wî gellek caran berjewendiya xwe û malbata xwe xiste pêxema berjewendiya neteweya xwe.

Cuda ji vê ku hizra nîştimanperweriya serkomar di pêxema berjewendiya neteweya wî bû, bi sedema vê ku pêşir dadwerek jêhatî bû, şiya bû ku li ser berçavgirtin û

Hejmar 198, 19'ê Çileya Paşîn a 2013

parastina mafê tak li nav civakê de bandorek bê mînak hebe. Piraniya axavtinê wî ku li vê serdemê de hatine hilgirtin, vê yekê diselimîne ku axavtinê wî li ser bingeha berjewendiya giştî bûne.

Gelek kes li dîrokê de bi tac û mîdalên ecêb hewil dan ku xwe li ber çavê civakê berçav, zeq û ciwan nîşan bidin, lê hezkirinek ku îrorojê bo cenabê Pêşewa heye, tenê bi sedema dadperwerbûna navbirî û xwe fidakirina wî bûye. Bi kurtî em dikarin bêjin ku serkomarê Kurdistanê li vê serdemê wêneya vîna neteweya xwe dixemiland, û niha jî ji serkirdeyên herî hezkirî li nav neteweya xwe de tê hesibandin.

Biryara dawiyê ya cenabê Pêşewa ku xwe fidakirina bo tenahiya neteweya wî bû, selmînerê vê rastiyê ye ku li cem wî erk û berpirsayetî, li serveyî berjewendiya wî a şexsî de hebû. Serokek serkevtî her demekê hest bi jêpirsîna li hember gel û dîrokê de dike, ji tu cure xisareke giştî natirse û xwebextkirin li pêxema berpirsayetî bi can û dil qebûl dike.

Cesûrî hewce ye ku li gotara her serkekî de hebe.

Eva hêza berz ya lînêrîn û hizra serkirde li gel şêweya derbirîna wî de ye ku li nav gel û dîrokê de nirxandin li ser tê kirin. Serok li derbirîna gotarekê de ku berjewendiya giştî ya neteweya wî têde dixuye, nasekine. Tewaya gotar û reftarê wî û biryarê wî, vê rastiyê diselimînin ku pêşewa ne tenê zana, xwedî hurmet û dilsoz, belkû serkirdeyekî cesûr bû, û li biryarê xwe de berjewendiyê netewî bi ser tev hêzên dagîrker û zilhêzên cîhanê de serwer kir.

Birêveberiya Komara Kurdistanê hecehî bi serokekê hebû, ku hem zanayane li ser rewşa bûyeran nirxanidn heban, û hem jî bawerî bi yasa û disiplînê heba, û hevçax li nasîna kesen derdora xwe de serkevtî ba, û gellek rastbînane pêngav hilgirtiban.

Diviya ew yek bi giştî li deselatdariyê de bihatiban gelale kirin ku soz û hezkirin li hember gel û nîştiman berçav bêne girtin. Erkek giran ku kêm serokekî li dîrokê de wek pêşewayê Kurdan "cenabê hezretê Qazî" kariye dîroka piştî xwe binivisîne.

Destêwerdana siyaseta sitratejîk a rejîma Îranê



Efşar Ceferî

Daxuyaniya nerazîbûnê ya welatên Erebî yên Konseya Hevkariya Kendavê li dijî destêwerdanê rejîma Îranê di nav kar û barên welatên vê herêmê de, rojev germ kir. Welatên han nerazîbûnek xurt ji tevgerên destêwerdanê eşkere yên Îranê di nav kar û barên welatên derdora Kendavê de girtin û xwestin ku rejîma Îranê dest ji wan kiryarêne xwe berde.

Destêwerdanê rejîma Îranê di nav karûbarê dewletên navçeya Rojhilata Navîn de, li dijî hemû pirensîp û konvansiyonê navneteweyî ne ku serweriya welitekê binpê dikan. Ev tevgera Îranê ne li ser daxwaza berpirs û râberên wan welatan tê encamdan, belkî hemû di çarçoveya îdeolojîk a rejîmê de û bo alozkirina rewşa navxwe ya wan welatan hatiye darêtin.

Ev helwêsta dewletên Kendavê belkî vê siyaseta Komara İslâmî eşkere bikin, lê ev ne tiştek nû ye.

Bingeha siyaseta destwerdana Komara İslâmî ya Îranê di nav kar û barên welatên neverê de vedigere bo destpêka bidestve girtina desthilatê ji aliyê vê rejîmê ve. Xumeynî wê demê biryar da ku bi hemû awayê mumkin "Şoreşa İslâmî" ku têza wî ya nû di cîhanê de bû, bo welatên din bişînin.

Bi taybet di wan welatên herêmê de ku îdeolojiya wan ligel rejîma Îranê cuda bû. Ji ber vê yekê ku bingeha rejîma olî ya Îranê li ser ola "Şîî" a 12 Îmamî hatiye avakirin, Xumeynî û rayedarên din ên Komara İslâmî xwestin bi rîya sazî û rêxistinê leşkerî û olî



îdeolojiya "Şoreşa İslâmî" li hemû welatên herêmê belav bikin.

Taktîkên karbidestên Komara İslâmî bona meşandina siyasetên xwe yên destwerdanê, bikaranîna pirsên olî û îmkanên aborî û mesrefkirina pereyên xeyalî bû.

Piştavanî ji grupên terorîstî û tundajo li herêmê û dayina çek û pereyên zêde bi van komên ajawegêr di çendîn salên borî de bû sedem ku çend car heta Rêexistina Netweyên Yekbûyî û welatên mezin ên cîhanê van kiryarêne rejîma Îranê şermezár bikin û hişyariyê bidin rejîma Îranê. Nimûneyên destwerdana rejîma Îranê di nav kar û barên welatên din pirr berçav û zêde ne, lê yên herî berçav, bikaranîna Hizbulahê li Başûrê Lubnanê li dijî Israîlê û alîkarî bi hinek grupên din re li navçeyen Felestînê, sazkirina Sipaha Quds û belavkirina vê hêzê li çendîn welatên neverê, çêkirina grupên radîkal ên Şîî li Yemen, Erebistana Seûdî, Behreyn û çend welatên din ên Erebî bona pêkanîna şoresh û nerazîbûnan, piştgiriya eşkere ji rejîma Bees a Sûriyê bi hemû awayekê, xurtkirin û piştavanî ji partî û grupên çekdar ên Şîî li Iraqê û Afganistanê.

Rojhilata Navîn çendîn sal e ku ligel şer û pevcûnên mezin re rûbirû ye. Yek ji sedemên bingehîn bon vê yekê destwerdan û rolê pirr xerab ê rejîma Îranê ye ku şerê xwe ligel Amerîka û Israîlê li ser axa welatên din dimeşîne. Lewma heta rejîma Îranê hebe û

destwerdanê di nav kar û barên welatên din de bike, aştî û xweş nakeve herêmê û her car li devekê dê fitne û alozî û nakokiyan pêk bîne.

Destwerdana Komara İslâmî ya Îranê li Sûriyê gihîste astekê ku bi eşkere hemû hewlan dide vê rejîma hevpeymanê xwe li ser desthilatê rabigire. Di rewşekê de ku xelkê azadîxwaz ê Sûriyê ji dîktatoryê bêzar bûye û berxwedana xelkê bo azadiyê dom dike, hezaran mirovên sivîl hatine kuştin, komkujî û cinayetên rejîma Sûriyê berdewam e û dehan hezar hevwelatiyên sivîl jî aware û derbider bûne. Pirr car dema li welitek cîhanê bûyerek biçûk diqewime, rejîma Îranê hawara xwe bilind dike, lê li hember kuştina sedan kesan rojane li Sûriyê bi destê rejîma Esed a hevpeymanê xwe kerr bûye û daxwaza kuştina zêde a xelkê nerazî jî dike. Hezaran çekdarên xwe ên Sipaha Pasdaran şandine Sûriyê daku xelkê qir bikin û hevpeymanê xwe li ser desthilatê biparêzin.

Destwerdan li kar û barên hundirê welatan û şandina "Şoreşa İslâmî" bo welatên din siyasetek stratejîk ya rejîma İslamiya Îranê ye. Pêwîste ku Netweyên Yekgirtî pêsiya wan kiryarêne rejîma Îranê bigre û welatên herêmê ciddîtir li hember van liv û tevgerên rejîma Îranê li ser serweriya welatên xwe derkevin.

Hejmar198, 19'ê Çileya Paşîn a 2013

Niqurçk



Mihemed Eli Mowehidî pêşnimêjê Tehranê got: "Xelkê me hêsta jî her evîndarê axûndan in û emegdariya xwe li hemberî xizmetkarê xwe de parastine".

Bi rastî ew axûndane ew qas xweşkok û ciwan in, ku mirov li ber agirê eşq û evîna wan nikare xwe ragire, îca xelk jî neheq ninin ku hemû rojên xwe bikne Valintayîn. Baše axûnd xweşkok û rind û ciwan in, lê negotine herkesê rind û ciwan mîna şemamokê bû, êdî bibe conega li ser serê alemê. Ho Mihemed Eli, te got axûnd xizmetkarin, axii Mihemed Eliyê nizanim çi, ma xizmetkarî mîna xizmetkariya axûndan be, xelkê zâlim bo çi ne?

Mele kazimê Sidîqî pêşnimêjê din ê Îranê dibêje: "Di serdemê Mihemed Riza Şahê Pehlewî de, bajarên Îranê di nav gendelî û fesadê de bat bibûn û heta axûnd siwarî erebeyan jî nedikirin".

Ku wusa bû dema ku em dibêjin li Japonê gendelî pirr kêm e, tê vê wateyê ku kompaniyayên "Toyota" yan "Hunda" berî vê ku berhemên xwe bêxne nav bazarê, hetmen fikra vê hindê dîkin ku gelo çawan hewzeya Îlmiyeya Qumê razî bikin ku komeke axûndan bişînne ser kolanên bajarê Tokyo li Japonê, da ku siwarî erebeyan wan bin. Lê em xwe xwe ne, mirov ci we veşere ci xwedê veşere, ma eva nine me jî 34 sal e axûnd li hêstra kore ya mam Qudret siwar kirine, û niha bi ci tişti nahêne xwar.

Mele Kazim di doma axavtina xwe de dibêje: "Heke weliyê feqîh nebe, ew berpirsên me, dê goşte canê hevudin bixon. Lê nenêre ku niha li ber gorenora weliyê feqîh nevîrin ci bikin". Qisên mele Kazim bo mehtkirina şerê pîşikan li nav hel û gova pêz de ew qas di ciyê xwe de ye, ku bawer kin zimanê min nagere ku ez tiştekî pêve zêde bikim. Tu dibêjî ka ew basê Tam û Cirî dike.

Ehmed Xatemî kesayetiyê naskirî ê rojên Înê yên Tehranê dibêje: "Piştî gefxwazrinê Îmam Xamineyî, yên ku hêsta jî bas ji azadiya hilbijartinê dîkin, ew dujmin in". Bila em erzî xizmeta Îmam Ehmed bikin ku hilbijartin berî keremkirina Îmam Xamineyî jî her heram bû, û yên azadî dixwestin jî, her dujmin bûn. Ku wusa bû çima tu basê tiştekî dikî ku di binê tûrkê Îmam de jî nebûye? Te xêre tu eniya xwe dikî girê, û tûka serê te bîzbîzî dibe. Dê toleransa te têk biçe û gorregorra te jî namîne haa. Êdî wê demê li hel û paga wîlayetê de, ceh jî nadne te, û tê di vê kirofeya zivistanê de tayîs bî, û li çol û çiya de sergerdan û aware bîmînî.

Axavtinên vê dawiyê ên Beşar Esed



N:Liz Silay

Roja 6'ê Çileya Paşîn Beşar Esed serkomarê Sûriyê li xwe derxistineke eşkere û kêmçûya de, tewaya wan kesan bêhêvî kir ku çavnihêr bûn hindî zûtir ew şerê navxweyî ji riya gotûbêj û danûsitandinan ve bigîje encamê. Di axavtinên vê dawiyê de avek paqîj bi ser destê xwe de dakir, û di axavtinêن xwe de tu nîşaneyek nîşan neda ku dixwaze destâ ji deshilatê hilgire, yan jî tevî neyarêن xwe bîhê ser maseya gotûbêjan.

Serhişkiya wî di şer de nîşan dide ku tevî vê ku sipaha Esed xakeke zêde ji dest de derketiye, weha dixuye ku zêdetir aliyê tundûtîjiyê bi xwe ve bigre, ku heta hevalbendên herî nêzîk ên wî jî zêdetir ji vê xwînrêjiyê nîgeran dîbin, ku her roj wek sitratijiyeke heyatî zêde dike û û zêdetir destê wî bi xwîna xelkê welatê wî sor dibe.

Di vê civînê de her çend ku vestiyayî dixuya, lê berberekanî dikir, her ku li xaneya opera di nawenda bajarê Dîmeşqê de dest bi axavtinê kir, tevî çepik lêdana germ ya alîgirêن xwe berbirû bû. Serkomar gelaleya pilanekê dariştibû bona guherînê ku têde hikumetekê Dema ku Beşar Esed ew yek got

nû pêk were, peymaneke netewî bîhê nivîsandin û referandom birêve here.

Pêşniyarêن Beşar Esed gellek na rohn bûn, her çawa be mîkanîzmek nedabû ku li jér vê mîkanîzmê de her wek opozisyon û piraniya welatê cîhanê daxwaz lê kiribûn ku dest ji deshilatê hilgire, lê ew naxwaze ku dest ji tu yek ji deshilatê xwe hilgire, ci bigîje bi vê ku deshilatê bide kesekî din. Di axavtinêن xwe de berpirsatîya vê malkambaxî û xwînrêjiyê xiste stûyê welatê rojawa û ragehand ku pêş sekinandina şer û bangkirina bo konferanseke netewî bo danîna xişteyekê bo çaksazîyan divêt dawî bi alîkariya bi opozisyonê re bê anîn.

Esed di yekemîn axavtina giştîa xwe di meha Juenê heyâ niha ku nêzî du salan dibe ku serhildan bi dijî deshilata wî dest pêkiriye, her demê xwe rewa û xwedî maf hesibandiye, û herweha ragehandiye ku divêt bi hêza leşkerî berengarî dijberan bibe û wan tepeser bike, û wan weke terorîst û ihanetkar bihesibîne, û li qiseyên xwed edibêje "Ew şer şereke li navbera welat û dujminen wî de. Şereke li navbera xelk û tawanbaran de. Ez dîsan we xatircem dikim, heyâ vê demê ku terorîstek di nav xaka Sûriyê de mabe, em şer bi dijî terorîzmê ranagirin". Dema ku Beşar Esed ew yek got

beşdarêن civînê çepik ji Beşar Esed re lêxistin û sirûd jêre gotin.

Di vî heyamî de ku Esede qise kir, hêla înternêtê li Dîmeşqê de qut bibû, û hêzên hikumetê pirsgehêن taybet li dewra paytextê danîbûn bo lêpirsîna ji xelkê. Bi vî halî jî tirsek ji dijberan hebû, heta di nav çeperên hêzên Esed de.

Lê qiseyêن Esed cihê nîgeraniyê bûn, serbarê wan hemî xwînrêtinan hêzên Esed beşek zaf ji xaka welatê xwe ji dest dane, bi vî halî jî wî jêve ye ku dikare deshilata xwe bidomîne, bê tu cure sazanekê yan dana tu poanekê. Xanima Vîktoriya Noland berdevê karûbarên Wezareta Derve a Amerîkayê li waşingtonê pêşniyarêن Esed ret kîrin, jiber ku ew jî nîşaneyek din ji destbernedana ji deshilatê ye bi armanca tepeseriya zêdetir ya xelkê Sûriyê.

Herçend ku pêşniyarêن Esed her ew bûn ku di derbasbûyî de kiribûn û li gorî rewşa welat, dijberan kariye li jér çetra sipaha Azad a Sûriyê de beşek zaf ji bakûr û rojhilata Sûriyê bi destve bigre, û radeyek berçev çek û teqemeniyan bi dest bixin. Lîkoler dibêjin ku bîrkirina Esed tu gehrtin bi ser de nehatine.

Sîbera Diplomasiyê

Serberdayiya Esed sîbera xwe xistiye ser vê pêla çalakiyên diplomasîya ku ji riya Ezzer İbrahimî, nûnerê taybet ê NY di holê de ye, hewil daye ku bi aramî û zext xistina li ser layenan kîşeyan li ser bingeha lihevhatinekê çareser bike, ku di meha Havîna borî li Jinêvê de, Amerîka û Rûsiye li ser wê lihevhatin, ku her du alî pêdgirin li ser û hewcehî bi rîçareya diplomasîye heye, lê girêdayî ye bi rolê her yek ji aliyan, heke bikin û Esed jî encam bide.

Esed li axavtina xwe de ew yek ragehand ku amade nine tevî opozisyonâ derve û tevî dijberen navxweyî ku niha li halê şer de

azad û 58 welatê nîve azad û herweha 47 welatê ne azad hene.

Nawenda "Freedom Haus"ê di nava 90 welatê azad de, 47 welatê weke Amerîka, Ustralya, Kanada, Birîtanya, Alman, Feransa, Komara Çêk û Lehistan, welatê herî azd dan nasîn û, di nava 47 welatê ne azad de jî 9 welatê weke Erebistan, Sûriye, Turkmenistan, Uzbekistan, Koreya Bakûr, Êritre, Gîneya Ustiwayî, Somalî û Südân jî, weke

ne, gotûbêjan bike, ku bê razîkirina wan serkewtin bê wate ye. Di demekê de ragehand ku: "dijberen me ku ideolojiya îslamî hene, pêwendîya wan bi Elqaîdeyê re heye, û opozisyonâ siyasî jî pêlîstoka destê welatê rojawayî ne û ihanet bi Sûriyê kirine". Dema diyarîkirî bo axatinê wî bi qasî payama wî watedar bû. Wî hewil dida ku dijberan biçûk nîşan bide, lê li çend heftiyê borî de gellek destkewtên leşkerî bi dest xistin.

Sernekevtian Esed bû sedema vê ku bo heyamê çend mehan li nav cemawerê xwe dse amade nebe. Vê yek guman pêk anîbû ku renge Esed ji rewşa xwe pirr nîgeran be, û zextek bêqas li sewr e, û rojbiroj ji koşka serkomariyê zêdetir dûr dikeve. Renge tîrsiya be û bîr ji silametî û pêşeroja xwe bike.

Bi vî halî jî her çend ku zer p lawaz dihate berçav, lê li ser axavtina xwe pêdagir bû, ew jî kuştar û xwînrêjî bû, û bona parastian deshilatê dest ji kursiyê xwe hilnagre, û li axavtina xwe de got: "bi tu awayekî em destâ ji rîbaza diyarîkirî a xwe naînin, dest ji mafê xwe nakêşin, emê bergirî ji welatê xwe bikin, û emê wek derbazbûyî emê berdewam bin". Ew gefen navbirî her wek axavtinên Qezafî dice, ku li demen dewiya deshilata xwe de dikir, û ew yek pîşeya tîwaya dîktatoran e.

Îran tenê welitek e ku piştevaniya axavtinên Beşar Esed kie. Elî Ekber Salîhî wezîrê karê derve û Iranê got: "ew gelaleyâ Esed dijî tundûtîjiyê ye. Dijî kiryarên terorîstî û destêwerdana derekî di vî welatî de ye, bona diyarîkirina pêşeroja welat li ser bingeha curbicurî û besdariya siyasî a hemû aliyeke".


W: Mo'tesem Nûranî

Çavkanî: www.washingtonpost.com

welatê herî ne azad dan nasîn.

Her li pêwendî digel hijmara idaman di Îranê de, hate ragehandin ku du hemwelatî bi tometa destdirêjiyê cinsî hatine idamkirin ku hukmê yek ji wan di girtîgeha bajarê Meşhedê û yê din jî, li ber çavê xelkê li herêma Sebzewarê hatiye cîbicî kirin.

Îran wek welitek ne azad hat nasîn



Şîdeta tepeserkirina rojnamenûs û çalakên siyasi û civakî û kêmâniyên din û, herweha bona hijmara herî bilin ya idaman di Îranê de, Îran weke welitek ne azad da nasîn.

Di raporê de hatiye ku di sala 2012'an de, di navbera 195 welatê cîhanê de, 90 welatên

Turkiye li pey hevalan digere



Şehab Xalidî

Hikumeta Turkiyê li gorî yasaya bingehîn ya vî welatî hikumeteke laîk e, û li serdemê Ataturk li ser bingeha cudahiya dîn ji dewletê hatiye avakirin. Kontrolkirina nawendên mesebî, qedexekirina kincêñ mesebî ji bo ruhaniyan li derveyî cihêñ mesebî, diyarîkirina rojêñ kekşemîyan wek rojêñ bêhnvedana fermî, û herwusa guherîna pîtên Erebî bo Latîn, ji girîngitîrîn karêñ Ataturk bona Laîkkirina sîstema deshilatdariya Turkiyê û yasayîkirina norm û pîvanêñ Ewropayî di vî welatî de bûn. Lê piştî nemana Ataturk hinek partiûrêkxirawêñ İslâmî hatin ava kirin, û bi hewildanek zor karîn mafê beşdarîkirina di hilbijartinan de bi dest bixin. Doma vê pêvajoyê piştî çendîn salî bidestve girtina deshilatê ji aliye AKP'ê ve lê ket.

Niha AKP dixwaze ku bibe modêlek bo tewaya welatên herêmê, û dixwaze weha nîşan bide ku ew pêşengî û rîbertiya welatên İslâmî ên herêmê dîkin û her di vê çarçoveyê de çend salan berî niha Turkiyê bi şandina alîkariyêñ madî bo rexê Xezeyê û piştî wê, axavtina tund ya Erdoxan bi dijî İsrâîlê li konferansa Davosê, pêwendîya



ji mêjîn a di navbera Îraîl û Turkiyê bo heyamekê têk da û bi vî awayî karî ku bala welatên İslâmî li vê herêmê de bo aliye xwe rakêse.

Lê li hember vê siyaseta Turkiyê de Erebistana Siûdî ku xwe wek pêşengê tewaya Musilmanen Cihanê li ser bingeha mesebê Sunnî dizane, li hemberî vê modêla Turkiyê de bûye astengekî micid. Ji aliye kî din ve Iran jî wan serhildanêñ welatên Erebî wek hisyariya İslâmî û doma şoreşa İslamiya Iranê dihesibîne, û modêla deshilatdariya xwe wek modêla herî baş bo herêmê nîşan dide.

Ku wusa bû di navbera Iran û Turkiyê de rikeberiyekmicid heye, lê bi sedema vê ku Turkiyê hewcehî bi enijiya Iranê û herweha şandina kalayan bo Iranê wek bazarek germ bo Turkiyê heye, naxwaze ku ew rikeberî

rengek eşkere bi xwe ve bigre. Turkiyê bona asayîbûna pêwendiyêñ xwe ên aborî bi Iranê re, heyamekê bû navbeynkar li navbera Iranê û welatên 5+1, li ser pirsa navikî a Iranê di dema gotûbêjan de.

Lê pêwendîya pirr ji evraz û nişîv li navbera her du aliyan de ku di gel avakirina Komara Turkiyê wek sîstema panturkîzmî û bûna endama her du welatan li peymana Sintû de dest pêkiriye, di gel gehîştina pêla Bûhara Erebî bo nav welatê Sûriye, û piştevaniya Turkiyê ji dijberên rejîma Beşar Esed, û danîna sekoya müşekiya Patiryot di nav xaka Turkiyê de. Edî ew pêwendiyane bber bi sarbûneke zêdetir ve çûn.

Ji aliye kî din ve jî pêvajoya wan gotûbêjan ku Turkiyê di gel Îmraliyê dest pêkiriye, neyarêñ aştî û azadiyê, bi taybetî Iranê ji caran nîgerantir kiriye, û heke her du alî wate Îmralî û Turkiyê bigîjne lihevhatineke baş, ew

Îraq ber bi kû ve diçe?



Kavûs Ezîzî

salekî ye ku herêma kurdistanê jî di heman warî de (Di warê binpêkirinêñ zagona bingehî ya welat de) li gel Malikî rastî astengîyan hatiye û heta niha jî tu çareserî ji wan kirîzan re nehatiye kirin.

Erebêñ Sunne heta hiloşiyana rîjîma Seddam, xwedîyê hemû deshelaşan, û hemû mafekî wan di Îraqê de li yên din, wek: Kurd, Erebêñ Şe û...hwd zortir bû. Lewra ew heta niha jî nikarin xwebidne qebûlandin ku êdî ew ne hakim in, û ew kîmîniyek in di Îraqê de. Lê eva jî li bîra me neçe ku Erebêñ Sunne ji aliye piraniya dewletên Sunîyê Erebîn ve têne alîkarî kirin, di heman demî de jî Erebêñ Sunne xwdan ceribandinê zêdetir in ji kurd û Şeýan, û dikarîbin zû xwe bi rîexistin bikin.

Piştî heyamek dirêj li binpêkirinêñ zagona bingehî ya Îraqê ji aliye serokwezîr Nûrî Malikî ve, Erebêñ Sunne jî rabûne ser piyan û xwepêşandan dest pêkirin. Ev nerazîbûna han di gel vê yekê tê ku heyamê

Gelo em bizanin ka armancêñ rabûne serpêyan ya Erebêñ Sunne ci ne, û kîjan aliyan dest têde hene?

Ev destpêka hanê ne cuda ye ji Buhara Erebî, û ne cuda ye jî ji rîzbendîya ku di herêmê de hatitye holê. Iran, Sûriye, Nûrî Malikî, Hizbulâha Lubnanê û hinek derdorêñ din weke bereya Şe xwe dane ba hev, û bûne xofek ji bo bereya Sunne ya deverê.

Ew bereya han di hember Sunîyan de ku Turkiyê, Qeter û Erebistana Siûdî sergêriya wan dikin, xwe ûlan kiriye. Milîmanê di navebra wan de pir xurt bûye, lê di warê piştgiriya navnetewî û îmkanêñ din de, bereya Sunîyan pirr bihêztire ji bereya Şe û Herdû alî ji wan bereya dixwazin xwe

Hejmar 19'ê Çileya Paşîn a 2013

yen bêguman li berjewendiya her du aliye hikumeta Turk û Kurd de dibe.

Ji aliye kî din ve jî Turkiyê li hember piştîvaniya bihêz ya rejîma Îranê ji Malikî û bi hinek sedemê din, pêwendiyêñ siyâsî û tîcarî ên xwe di gel hikumeta herêma Kurdistanê ew qas bihêz kiriye ku niha Herêma Kurdistanê ji riya Turkiyê ve petrolê bo derveyî welat dişîne, diyare ew pêwendîya di warê aborî de qazanceke zor digehîne her du aliyan. Lewra her du alî hewil didin ku pirsên navxweyî ên Turkiyê wek pirsa Kurd nebe asteng li ser riya pêwendiyêñ wan ên bihêz. Di rastî de ew pêwendîya bihêz serokwezîrîl Îraqê gellek nîgeran kiriye.

Ji aliye kî din ve li Kurdistana Sûriyê reng be PYD astengetek micid be li ser riya vê Turkiyê ku heya niha piştevanê bihêz ê dijberên Beşar Esed bûye. Lewra berjewendiya Turkiyê li ragirtina şer li gel PKK û destpêkirina gotûbêjîn aştîyê de ye. Bi vî awayî Turkiyê hem dikare ewlehiya welatê xwe biparêze û aboriya wî welatî geşe bike, û ji aliye kî din ve dikare di pêşerojêde li gel Kurdên Kurdistana Sûriyê, wek herêmeke otonim pêwendîyeke dostane ava bike.

Bê guman girtine pêş a riya bîdiyalogê û avakirina sîstemeke demokratîk ku têde bi bê ferq û cudahî tewaya neteweyan bigîjne mafêñ xwe, û bixwe qedera xwe diyarî bikin, tenê riya geşekirina welat û baştîrîn model bo deshilatdarî li herêmê de, bi taybetî bo Turkiyê ye.

berfirehtir bikin.

Her wek me got ku di Îraqê de Erebêñ Sunne li pey wan poanêñ ku bi hloşiyana seddam ji dest dane digerin. Bo vê mijarê jî dixwazin pêngava destpêkê bi vî awayî be:

Xwe birêexistinkirin ji bo ûlan kirina herêmek federalî a Sunne

Di hember alaya Îraqê û ya Kurdistanê de, hildana alaya serdemâ seddam wek alaya herêma Sunne. Dest xistina piştgiriya dewletên Sunne û Turkiyê û ...hwd bo guhertina zagona bingehîn ya Îraqê, da ku bikarîbin ber bi vegerandina deverên veqetiyayî yêndî kurdistanê bo ser herêma kurdistanê ve herin.

Îraq û pêşerojek nediyar



Arif Vêlzi



Nemana deselata Sunî li Îraqê û piştevaniya şeyen herêmê bi taybetî rejîma Komara İslâmî ku xwedî pêgeyek bihêz a siyasî, abûrî û mezhebî ye di vê welatî de, rewşek pê anî ku, di qada siyasî a Îraqê de, şie bibe xwediyyê giraniyeke siyasî û herweha Kurd jî wek neteweyeke belengaz, li dîroka Îraqê de, li gorî destûrê li hikumeta tewafiqî ya wî welatî de bû xwediyyê mafê xwebirêve birin li besêk ji herêmên xwe de.

Di hilbijartinê sala 2010'an de piştî kêse û gengeşeyekî zor, bi lihevhatina di gel lîsta Elîraqiye û hinek ji pêkhateyên din, Nûrî Malikî bo cara duymîn bû serokwezîrê Îraqê, lê vê carê bona parastina berjewendiyên xwe û hevalbendê xwe metoda tekrewiya siyasî girtê pêş, bi dûr ji her terze yasa û rêsayekê, û heta bi liberçav negirtina lihevhatinê siyasîen di navbera aliyan Tewafoq li deshilatdariya siyasî a Îraqê de, kiryarêne kêsesaz ên wek cîbînêkirina madeya 140 û çaresernekirina kêşeyen wek neft, budge, pêşmerge û ... derheq Kurd û dûrxistina hevalbendar û qebzekirina dezgehêne aborî, leşkerî û emnî, keysa Tariq Haşimî û li ya herî nû de pêkanîna hêza operasyona Dîcle û girtina

pasewanên Rafî' Îsawî, û komek kêşeyen din derheq Suniyan encamda ku bûne sedema alozbûna rewşa siyasî li Bexdayê, û qonaxeke nû ji rikeberiya siyasî, tayifi û mesebî li Îraqê de serî hilda ku di destpêkê de baykota Encomena Nûneran û gefxwarina vekişiana aliyan ji hikumetê, û di dawiyê de jî meşa cenawerî li parêzgeha Enbar û Felûce û li herêmên din ên Sûneakincî lê ket, û bi vî awayî warê emnî û tenahiya Îraqê tevlîhev bû.

Bê guman destêwerdana rejîma Îranê li nav karûbarêne Îraqê de û piştevanî ji Malîkî ji aliye din ve, û destêwerdan û piştevaniya hinek welatên din ên herêmê ji Suniyan li hemberî Şîyan ew rewşa pirr ji kirîz lê ket, lewra hewce ye ku hêzên siyasî ên Kurd li ser bingeha berjewendiya netewî, û ji riya cihêne pêwendîdar û bi bandor, gellek hûrbînane reftarê bi vê rewşa pirr alov u hestyar ya Îraqê re bikin û bi dûr ji pirsên navxweyî bîr ji yekîti û pirsên netewî û sitratejîk ên xwe li ser astê Îraqê de bikin, ku bi xweşî ve ew yekîtiya berçav dikeve.

Jiber ku bidestveanîna zêdetir ya mafêne gelê Kurd di vî welatê pirr ji kêse û pirr kirîz de tenê ji riya yekîtiya wan hêzên siyasî ve ser digre û herweha Kurd bi vê yekîtiya xwe dikare, wek hêzek ektîv û çalak bandora xwe ya pozetîv hebe bo nêzîkbûn û çareserkirina vê kirîza niha ku Îraqê di dest de dinalîne.

Îmamzade rojê 180 milyon Tûmenî alîkariya Xamineyî dîkin

Dahata Xamineyî di neh mehîn derbazbûyî de digîje 51 milyard tûmenî

Ehmed Şerefxanî, cêgirê saziya Ewqaf û karûbarêne xeyriye ragehan ku Ev dahata han ya 9 hezar û 192 Îmamzadeyan e.

Berpîrsyarêne saziya navbirî ku rasterast ji aliye Xamineyî



ve têne hilbijartin, serbarê hewlêne du nûnerêne Parlementa Îranê, amade nînin ku hûrdekariyê bikaranîna bûdcaya han bas bikin.

Rojev

Tarîperest ji ronahiyê tirsîyan, lewra xwîna Ronahî û hevalêne wî rijandin



Selim Zencirî

çareseriya vê pirsê bi zirara xwe dibînin. Sûriyê ku li ser kendalê gor e û hinde nemaye ku tevlî kîrsînâ dîrokê bibe, lê Îran ku ektorek din ê deverê û serkêşî û pêşengîya baskê tarî li deverê de dike, li rikeberiyek xurt bi Turkiyê re ye û dixwaze idêolojiya xwe li deverê de bide sepanin. Herweha li asta navnetewî de jî li bin zext û gîvaşen siyasî û aborî de ye û mana xwe li afirandina kirîzan de dibîne, bi taybet ku pêşîne û karnameyek tejî ji terorê jî heye. Lewma siroşti ye ku ew Turkiyeyek aram, ewle û demokratik nexwazin ku pirîşkên xwe bawêje nava wan de jî.

Terora sê siyasetvan û çalakvanen kurd li destpêka sala nû ya zayînî li bîroya Enformasiyona Kurd li Parîs de şokek mezin da Turkiyê û kurdan. Şokek ku her midêhê carekê qedera wî miletî bindest tevlîhev û alov dike û bijarde û nirxên wê bi armanc digre û ji bilî standina wan ji me, tesîrê ji saykolojî û rewanê kurdan dike û dixwazin tirs û wehşetê bêxin nava Kurdan de.

Terora vê carê a Parîsê jî armancdar e. Ji ber ku her gav kurd û hikûmeta tirk xwastine diyalogê bi armanca çareseriya pirsê bikin, pirovaksiyonek ji hêla hin aliye tarî ve çê bûye û guftigo têk daye. Vê carê jî heman senaryo! Em dibînin ku dewrek nû ji danûstandina dewleta Turkiyê û kurdan bo lihevhatinê (Çiqas bawerî û semîmiyet heye, ne zelal e) dest pê kiriye, demûdest destê reş ê terorê xwe gîhand nav pirsê. Mixabin ji her du aliyan ve jî her kurd zerermend bûne, him gorî kurd in him jî xwediyyê pirsê kurde ku dîsan pare dimîne.

Terora vê carê li demek gelek hesas a dîrokî û siyasî de hat encamdayîn. Demek ku cîhan bi giştî û dever ketiye ber bayê guhertinan û pêlîn bihêze guhertinxaziyê hevkêşeyen siyasî diuguherîne û balansa hêzê û nemaze xerîteya siyasî jî guhertinê bi ser de tîne. Pêvajoya çareseriya pirsa kurd li Turkiyê jî ku têkadna wê armanca vê terorê bû, ne tenê pêwendî bi Turkiyê, belkî bi gelek welatên din yên deverê ku kurd têde dijîn heye û çiqas ji destê wan bê, vê hewla têkdan û sitewr kirina pêvajoyê bidin. Çunku çareseriya pirsa kurd li Turkiyê, rî li ber gelek pêşketinê Turkiyê vedike û li deverê de jî wê bibe listikvan û ektoê sereke û bi taybetî pêşengîya cîhana İslâmî bike. Hevdem ev hêviyê çareseriye tesîrê li guhertinê nav Sûriyê de jî dike û dikare alîkar û lezatiyê bide hiloşandina rejîma Esed. Bi taybetî Sûriye û Îran ku zêdetir ji her kesî

Berpîrsatiyek dîrokî

Her ci be taze teror hatîye encamdayîn û me ew ji dest dan û li her şeklî de jî hat mehkûm kirin, lê ya girîng ew e ku her kes bi berpîrsatî tevbîgere û ya ku dikewe ser milê wan, bona çareseriya aşıyane encam bidin. Hikûmeta Firansa bona wê ku xwe bikre û rî li ber dubarebûna terorêne weha bigre divê berpîrsiyar û bikujan eşkere bike û bûyerê tarî û li piş perdeyan de nehèle û neke qurbaniyê berjewendiyen siyasî û aborî ên xwe, ji ber ku weke terora Viyenê dê rûrêş dîrokê bibe. Aliyê kurd û hikûmeta Turkiyê jî nabin bikewin vê telik û dawika metîrsîdar ku armanc xurtkirina agirê şer û kuştinê ye. Bona wê ku dem heder neçe, divê her du alî pêgir bin li ser domandina pêvajoyê. Daku bi çareseriya pirsê re bibin bersivek xurt bo daxwazîn wan cangoriyan di nav çavêne nejadperest, dîktator û terorîstên deverê ku bûna xwe li wehşetê de dibînin..

Çima telaq di Îranê de ew qas zêde ye



Sefye xaldî



Li despêka peydabûna mirovan li ser topa erdê heta niha hertim jin û mîr bihevre jiyane û zarok çêkirine, di çarçovekê de bi navê malbatê di gel yasayê rêk û pêk û pir ji evîn û hezkirin jîyan bi xweşî meşandine, bona ku mirovan di ser du qatan de parve bikin: Jîyanâ berî zewacê û jîyanâ piştî zewacê.

Dema mirov bîryar dide ku bizewice, di heman demê de berpirse li hember bîryara xwe, jîyanâ mirov pişk dibe û bi tenê çenâbe ku di qonaxê jîyanê de bîryaran bide û bixebite, jiber ku ew naçare raya hevala/ê xwe jî bipejirîne û bikar bîne. Zewacê wateyek serekî heye bi navê parastina nîfş, ger ku zewcîn tunebe û têkiliyê jin û mîran kêm bin, sedî sed pêşeroja mirovan metirsîdar e, herwusa zewac tîcaret nine, hekî zewacê wek girêbest lê binêrin, gelek berçave ku temenê wê kurt e, û tenê bûyera nexweş ku rû dide bûyera telaqê ye.

Telaq hîsa têkçûn û tinêtiyê û bextreşiyê dide însanan, lê gelek jin û mîr piştî telaqê dilxweş dibin, cûnkî jîyanâ hewseriya wan şas bûye, bûyera telaqê gelek sebeb û sedemên cur bi cur hene.

Di wan salêن davî û di gel pêşveçûna jîyanâ bajarî û guhertinêñ şêweya jîyanâ sunetî ber bi jîyanâ modern ve, sîstema malbatî digel guhertinêñ cur bi cur berbirû bûye, bi awayekî bûye sedema zêdebûna hijmara telaqê, kûrahiya wê babetê heya radeyekî ye ku, bi bawerîya civaknasan di îro demê de gelek zirarêñ malbatî siyasî, aborî, çandî, girêdayî bi pirsgirêka telaqê ve hene û bandorn nêgetîv dixe ser pêşkevtin û serkevtina civakê.

Di vê serdemê de dab û nerîten civaka kevnar dijî civaka modêrîn e, û qata nizim a

civakê wan baweriyêñ kevnar diparêzin, qata nizim (hejar) seba neçariya jinan û xwe girêdana wan bi mîran bo vê ku bijîn û, herweha seba vê ku di nava qata nizm a civakê de, telaq karek xirab û têkçûnek mezin e bi taybet ji bo jin û zarokan û bi baveriya wan, jin namûsa mîr e û bi kultûra çend jîniyê razîtirin heya telaq û ji hev veqetîyanê, lê di qata nawendî de ku hem girêdayiya jin bi mîr re kêmter e û hem jî piraniya mîrîn wan malbatan, yan xwedî kar û kasibiyek azad in, yan karmend û xwedî pîse ne. Di dema kêmberû yan nedana müçeyen karmendiyê û herweha bêkarî û tengkirina derfetêñ pîşeyen azad ji aliyê rejîma Îranê ve ku niha seranserê welatê Îranê dagirtiye, asta jîyanâ wê qata civakê nizimtir dike, û eva jî xwezayî ye ku pirsgirêk di hundirê malbatan de ser hildin.

Piraniya bûyerîn telaqê di vê qata civakê de rû dide. Qata sêhemîn ku qata bilind (dewlemend) e, seba hebûna îmkanatêñ jîyanê û nebûna hewcehiyê madî û derûnî, kêmter digel pirsgirêkê han berbirû dibin û, lewma di vê qata civakê de bûyera telaqê kêmter tê xûyakirin. Li gorî zanyariyê civaknasan, di navbera pênc salêñ destpêka jîyanâ hewseriyê de telaq rû dide û ew çend sal gellek hesas û girîng in. Li gor serhejmîrî û lêkolînan, di sala 1391'an de, temenê wan mîran ku tûşî bûyera telaqê dibin 25 heya 29 salî û temenê jinan jî 20 heya 26 salî ye, herweha nêzîkî %15 ji wan bûyera di nava sala yêkem a jîyanâ hewserî de û, %50 jî di navbera pênc salêñ despêka jîyanê rû daye. Hijmara

zewacê ji sedî sê û hijmara telaqê ji sedî 10e, û pitir ji %80 daxwazkarêñ telaqê, ev jin in ku temenê 15% ji wan di navbera 20 heya 24 saliyê de ne.

Piraniya civaknasan sebeba herî girîng a zêdebûna amara telaqê, vedigerînne ser nebûna nasyariya jin û mîran bi hevre û, çareseriya wê jî vedigere ser fêrkirin û nîşandana rabûn û rûniştinêñ baş û pêşkevtî, ku bi şêweyêñ cur bi cur têñ bikaranîn. Bo mînak: Bi wergirtina zanyariyê mentiqî li dor mijara zewacê û herweha dab û nerîten poztîv ên malbatî, zêdekirina dema desteserkirinê ku 9 heya 12 mehan tê pêşniyarkirin, bona zêde hevdu naskirinê, hemşêvrî di gel pspor û kesen serkevtî di vî warî de. Mixabin gellek qîz û xorîn me di dema hilbijartina hevala/ê xwe, tenê giringiyê didin bejin û bal û rîçûna wê/wî û, herweha nêzîkî %40'ê ji qîzan pêş zewacê, tu gotin û mercek ji bo hilbijartina zilamê xwe nînin û dibêjin, tenê ji hevdu hezkirin girîng e!

Yek ji sebebêñ serek ên telaqê, pirsgirêkê aborî ye û herweha nezanî û ne xwendewarî jî bandorek mezin xistiye ser mijarê. Lî malbat jî xwe bê súçdar nizanîn, ji ber ku gellek malbat bitaybet malbatêñ kurd di Îranê de, girîngiyê nadî temenê zarokan û, herweha çêkirina pirsgirêkê mezin wek mareyî û kirrîna tiştîn zêde û binirx û...hwd, ku di pêşerojê de dibin sedema vê yekê ku dilsarî di navbera bûk û zava de çêbe.

Karkirina jinan bandorek girîng dixe ser kêmkirina amara telaqê, bi awayekî ku jimara telaqê di nav jinêñ ku mamoste ne ji sedî 4 ta 5 e, lê di nav jinêñ karmend û xwedî pêse de %10 e, û zêdetirin hijmara telaqê, vedigere bo jinêñ kebanî û maldar, ku ev jî %68 e. Lêkolîn vê yekê diselimînin ku,

Hejmar 198, 19'ê Çileya Paşîn a 2013


têkeliyêñ hewserî, dilovanî, evîn, hurmet û ji hevdu fahmkirina dualî dibe sedema serkevtina jiyana hevpar. Dibe jin û mîr di têkeliyêñ xwe ên cinsî de, hevdu fahm bikin û derfeta nîşandana hîsa xwe bidin hevdu û, paqîjî û evînê biparêzin da ku jin dilsar nebe û mîr jî şîyan hebe ku têkeliyêñ wan, hêmîniyê bide derûna wan. Li gor çavkaniyê rijîma Îranê %78 sedemên telaqê pirsgirêkê jînsi di navbera jin û mîrîn Îranê de ye. Lê mixabin ev mijar tu caran nehatiye çareserkirin, cûnkî bawerî û siyasetên xelet ên rejîma Îranê rî li pêsiya xelkê girtiye. Siyasetên weke qedexekirina setelayt û nebûna pirogramek zanistî bona nasandina jin û mîr di warê fîzîkî û ruhî de. Heta rî ji hez û peywendiyêñ weke axaftin û kincîn keç û kuran di civakê de digire.

Telaq di her civakekê de pirsek xwezayî ye, lê zêdebûna wê gefek mezin e. Civaka Îranê û welatêñ Ewropayî, bi tu awayekê wekhev nahê şirovekirin, lê mixabin xelkê Îranê, çavlêkeriyek pir zêde dike, pêşveçûn ne xirab e lê hilbijartina kultûrek ku tu zaniyarî ser wê nîne xirab e û, ne tenê dibe sedema paşvemana wan kesan belkî dibe sedema têkçuna hêmîniyâ jîyanê jî. Niha li Tehrana pêttextê Îranê ku nîşana kultûra Îranê ye, amara telaqê di îsal de gehîst nêzîkî 17 hezar û 846 kesan û li gor sala çiyî %6 zêdetir bûye. Bawerîya jin û mîrîn Tehranî di wê serdemê de bi zewaca ne fermî ber bi zêdebûnê ve dice. Zewacek ku têde bi awayek fermî nebin jin û mîr, belkî azad bin û her kes çava dixwaze jîyan bike û mal û milkê wan cuda ye û temenê zewaca piraniya wan jî kêmter ji salekê ye. Rewşa peywendiyêñ malbatî di Tehran û Elborzê de metirsîdare û civaka Îranî lawaz û tevlîheve dike, lê rijîma ku dijî mafê mirov û jin e, tu pêngavekî ji bo çareserkirina wê pirsgirêkê navêye.

Dibe riyêñ zanistî û pêşkevtî li gor jîyanâ îro a xelkê cîhanê bixin pêşberî xelkê Îranê. Lewma tu kes xincî rijîma Komara İslâmî tawanbar nine, cûnkî rîjîm bi bawerîya xwe ên sunetî û derevîn xelkê hejar dixapîne û, xelkê zana jî direvin û di gel pirsgirêkê civakî weke çend jinî, zîlm û zora derheq zarokan, bikaranîna madeyêñ hişber, qaçax û firotina jin û zarokan, bêkarî, xwekuştin û şewitandina jinan, zewaca bi zorî, tecawiz bi jin û zarokan, iŞkencîn jîsmî û ruhî bûne agir ku civaka Kurd, Turk, Ereb, ... hwd jî bişewtîne.

Salih Kerîmiyan:

Dr. Qasimlo aşpêj gazî kir û gotê: "Çima te şeş pirtikên goşt min re têkirine, lê bo vî pêşmergê sê pirtik? Em her du her pêşmergê PDKÎ ne, û para me wek hevudin e, û sê pirtikên goştê di nav taska min de cardin vegevîne nava muncelê de".



Hevpeyvîn: Faxir Molûdî

Salih Kerîmiyan naskirî bi Mam Salih, kurê Mihemed, sala 1326'an, li gundê Nerwî ya ser bi bajarê Pawê, di malbatek cotyar û zehmetkêş de tê dinê.

Gundê Nerwî jî weke piraniya gund û deverên din ên Kurdistanê ji xwendingeñ û nawendêñ fêr bûnê bêpar dibe û tu îmkanatêñ xwendinê bo xelkê nehatine dabînkin, lewma Salih jî nikare here mektebê û dersê bixwîne. Mam Salih her di despêka zarokatiya xwe de tevî malbata xwe dest davêje karê cotyarî û ajeldariyê û heyâ serheldana şoreşa gelên Îranê li ser karê xwe berdewam dibe.

Salih Kerîmiyan weha basê nasyariya xwe bi PDKÎ re dike; Di serdemê Komara Kurdistanê de, Pêşmerge, endam û alîgrêñ PDKÎ di devera me de hebûn, lê me nas nedikirin. Lê hevdem digel şoreşa gelên Îranê û hatine serkara rêtîma Komara İslâmî de kadrek hizbê bi navê Eskender ku xelkê bajarê Nodşê bû, dihat û basê mafê netewî û gelê Kurd bi me re dikir û herweha digit ku PDKÎ niha endamgîriyê dike û hewcehî bi xorten weke we heye. Gotinê Eskender bandoreke pozitîv xist

ser me û min Û Mela Ehmed Rehîmî weke endam navê xwe nivîsand û her li gund de me rêkxiraw ava kir. Eva despêka nasyariya min bi mijarêni siyasi û netewî û PDKÎ bû.

Navbirî herweha dibêje ku "Di Buhara sala 1358'an de, ez çûm bal komîte şaristanê û min daxwaz jê kir ku dixwazim weke pêşmerge xebata xwe ya siyasi bidomînim. Berpirsê komîtê ku şehîd Ebdulla Behramî bû, daxwaza min pejirand û çeka peşmergatiyê dan min û ez bi awayek fermî bûm pêşmergê PDKÎ û heyâ niha jî li ser xebata xwe berdewam im, û heyâ roja dawî a jiyana xwe jî rîbaza Demokratê bernadim.

Salih Kerîmiyan derheq jiyana xwe ya hevpar weha bi Agirîye re diaxive: "Payîza sala 1351'an de, min di gel Helîme Miradî her li gundê xwe de jiyana hevpar pêk anî û berhemâ jiyana me jî du keç û kurek in".

Mam Salihê xebatkar herweha dibêje ku, di dema kîmyabarana Helebçê de, wate eva 24 sal e ku min jin û zarokêñ xwe nedîtine, û ji wan dûr im, lewma bi tenê hêviyeke min heye, ev jî ev e ku cardin vegevîm nava malbata xwe de û tevî jin û zarokêñ xwe jiyane bikim.

Mam Salih di bersiva pirsyara xweşiyêñ jiyana pêşmergatiyê de got; "Pêşmerge rojêñ xweş di jiyana xwe de nedîtine, jiber ku rojekê şer e, rojekê bê xewîye, rojekê bîrsîti ye, rojekê jidestdana hevalan e û...hwd.

Lê roja herî xweş a jiyana xwe, weke bîrewerî weha tîne ziman: "Em li Qendîlê bûn, dema xwarina nanê nîvro hat, em çûn nav rîza wergirtina xwarinê de, piştî bîstekê min dît ku Dr. Qasimlu piştî min di rîzê de ye, min pir şerim kir û pêre got, qurban ez di şerman de mirim, çima tu nahê pêsiya min? Di bersiva min de got ku

tu cudahî di navbera pêşmerge de nîne, û bi tenê erkê min ji te zêdetir e, û ez weke sekreterê partiyê hatime helbijartin. Aşpêji risq bo min têkir û dema min dixwest herim û nanê xwe bixom, Kak Dr. Qasimlo min re got bisikine, dema xwarina wê jî amade bû, min re got, "Di tasika te de çend pirtikên goşt hene?" min jî di bersivê de got "Qurban sê pirtik hene". Wî aşpêj gazî kir û gotê: "çima te şeş pirtikên goşt min re têkitine, lê bo vî pêşmergê sê pirtik? Em her du her pêşmergê PDKÎ ne, û para me wek hevudin e, û sê pirtikên ji goştê taska min cardin vegevîne nava muncelê de". Herweha li dor roja herî nexweş a jiyana xwe wîpîşmergî fidakar got: "Ez li Qislanê di mequerê Komîte şaristanê de bûm ku, ji nişke ve RDKÎ nûçeya birîndar bûna Kak Dr. Qasimlo belav kir. Em bi giştî pir nerehet bûn, lê eva ku hindek dilxweşîya me dida ev bû ku heşta Dr. Qasimlo şehîd nebûye.

Lê mixabin roja din



Eva 24 sal e ku min jin û zarokêñ xwe nedîtine, û ji wan dûr im, lewma bi tenê hêviyeke min heye, ev jî ev e ku cardin vegevîm nava malbata xwe de û tevî jin û zarokêñ xwe jiyane bikim

nûçeya şehîd ketina navbirî belav hate bilavkirin. Di rastî de ez pir nerehet bûm. Min tu hêvî neman. Ez niha jî heyirîme ku çawan ez tûşî kirîza dil nebûm. Kadr û pêşmerge pir bê hêvî ketin, lê dema Dr. Sadiq di cihê şehîd Qasimlo de rûnişt, cardin em rabûn ser piyêñ xwe û mezanî ku PDKÎ her weke berê xebata xwe didomîne. Salihê pêşmerge dibêje; "Piştî wan hemû salêñ xebata min ku têde ciwanî, sermaye, jin û zarok û temenê min tê de çû, bi tenê çavnihêriyek min jî PDKÎ heye, ev jî eve ku bi çavê rîz û hurmetê li me binêre.

Di dawiyê de Mam Salih rû li xelkê Kurdistanê dibêje: "Ez weke kesekî ku min temenê xwe di pêxema azadiya gelê xwe de daniye, daxwazê ji xelkê Kurdistanê dikim ku alîkar û piştevanê PDKÎ bin, jiber ku bi baweriya min bi tenê PDKÎ ye ku dikarê vê xelkê rizgar bike û hikumeta dahatî ya Kurdistanê bigire destê xwe.

Herweha gazî xorten Kurdan dikim ku, bêñ û refêñ PDKÎ pir bikin û xebat û berxwedanê her germ ragirin.

Bajarê Pawe



Mecid Cinikanlu

Şaristana Pawe yek ji Şaristanen herî bi nav û deng ê parêzgeha Kırmaşanê ye. Bajarê Pawe li 112 kilometriya bakûrê rojavayê bajarê Kırmaşanê cih girtiye û piştî derbas kirina hin rûyên asteng ên zincire çiyayên Zagros, bajarek wek Pêlekana xûya dike ku ew bajar Pawe ye. Bajarê Pawe seba xwezaya bedev û bê mînak bi yek ji bajarê herî xweş ê Kurdistana Iranê û bigire Iranê tê, naskirin ku xwezaya dewlemend a wî bajarî li gel jîyana xelkê bajar têkel bûye û wek navendekî geryanê lê hatiye.

Şaristana Pawe bi bilindahiya 1463 mîtroyan ji behra azad û barîna salan a 830 milîmîtr baran û berfê û av û seqaya navendî a çiyayî li parêzgeha Kırmaşan a Rojhilatê Kurdistanê cih girtiye.

Nifûsa şaristana Pawe li gor serjimêriyên sala 1385 a rojî 55889 hezar kese û panahiya vê 803 kilometra cargoşe ye. Şaristana Pawe ji aliyê bakûr tevî şaristana Merîwan, ê û ji aliyê başûr tevî şaristana Ciwanroyê û



ji aliyê rojhilat tevî şaristana Sinê hevsînor e. Her wiha şaristana Pawe ji aliyê rojava bi dirêjahiya 96 kilometran tevî başûrê Kurdistanê hav sînore.

Şaristana Pawe xwedîyê 1169 hezar hektar erdên çandinîyê, 83100 hektar daristan, 39924/91 hektar lêrewar û 5847 hezar hektar zevîyên akincî bûnê ye.

Li herêmê de bi deyan çem û rûbarê mezin û kûşke di herikin. Çemê mezin û bi nav û deng ê Sîrwan di vê herêmê de derbas dibe û avedaniyek baş jibo herêmê çekiriye. her wisa di herêmê de çend çemên din ê wek Leyle, Mirxîl û çemê pawe hene ku her yekê taybetmendiyen xwe hene û jibo avedaniya herêmê rolek bingehîn hene.

çiyayîn herêma Pawe û hewramanê ku pişkek ji çiyayên Zagros ê ne, çiyayê Şaho li hembêz digirin. Şaho bi bilindîya 3400 metrean yek ji çiyayîn herî bilind ê Kurdistana Iranê ye ku li bakûrê rojhilatê

bajarê Pawe cih girtiye. her wisa çiyayê Ateêga ku çiyayekî dîrokî û xwedî gelek taybetmendiyen e li cem bajarê Pawe ravestane. Çiyayê Ateşgah di serdemê Zerdeştiyan cihê hilkirina agirê pîroz ê Zerdeştiyan bûye. Bilindahiya çiyayê han 2469 metre. li wan çiyayîn bilin û xweş de bi sedan bax û baxçe hene ku fiqîyen wek: Gîz, Tot, Hinar, Gilhinar û... têde berhem dê.

Pawe yek ji 13 şaristanen parêzgeha Kırmaşanê ye û sê herêm û çar bajêr û pênc dêhêstan hene ku dîroka akincî bûnê li herêmê de jibo 2hezar salan berî niha vedigere ku çekirina wî bajarî ji kevirekê bi nave Hezar Masûle hatiye çekirin.

Li ser peyva Pawe gelek bîr û ra hene, lê pêka gotinê xelkê herêmê û peyvîn zaravê Hewramî, pawe bi wateya paqij tê. Lî hin kes jî dibêjin ku Pawe ji navê serdarê Yezdgirdê Sê tê, û ku Pawe kurê Şapûr û biraziyê Newşîrwan ê Sasanî bûye ku Yezdgird nav hatî jibo berfirh kirina olê Zerdeşti şandiye herêmê.

Li zaravê Kurdi a Hewramî de

kurdistanê jî, hem Sunne û hem dewletên navhatî, tu caran naxwazin weke Kurdistan nas bikin, lewma jî zivirandina wan bo ser herêmê rastî astengiyen mezin dibe.

Di vî halî de Malikî û Şîe jî dûr nine ku pişa Sunneyan bigrin û kurd bi tenê bimînin. Yanî derdor dixwazin kurdan û Erebê Sunne bihevre bikevne rikeberiyê ku bi hizra min di vê navberê de zirara mezin li kurdan dikeve. Malikî û Şîe her hakim dibin li welat de, deveren vejetiyayî naaktivne ser herêma kurdistanê, û dê bibne beşek ji herêma Sunneyan.

Di dawiyê de ez êvî dikim ku serkirdiyetiya siyasi a başûrê kurdistanê cehdê bike bo yekrêzî û bihevre karkirinê, heke kurd di



roja îro de yekgirtî neçe meydanê, ez bawerim destkevtên kurdan kêm dibin.

Encam

Di lîstika navbera Şîe û Suneyen deverê de kurd heke yekîtiya xwe



neparêzin û bi hûrî tevnegerin, wê zirarê bibînin. Alîkar û hevdesten Sunneyan pirr in, û îmkânên wan jî pirr in. Bitaybeti dewleta Turkiyê dixwaze ji rêka Erebê Sunne ve nehèle kurd deveren vejetiyayî vegerînne ser herêma kurdistanê, û bikne beşek ji herêma Sunneyan.

Her seba vê yekê li herêmê de gelek cih hene ku xelkê herêmê jibo ziyaretê serdana wan cihan dîkin û ji aliyê xelkê herêmê weke cihê pîroz têne hesibandin.

Bo mînak em dikarin amaje bi Îmam Zade Seyd Ûbeydula, birayê Îmam Riza û naskirî bi Kose Hecic bikin. Her wisa zaf cihê din wek: Sultan İshaq, Seyd Mehmud Esfehanî, Şêx Mihemed Ezîz, Şêx Hisam û Qurana gundê Zerdoyî bikin.

Kurdên Pawe di refêن tevgera rizgarîxwez a netewa Kurd gelek quranî û bedîlên mezin dane û di rîya hande gelek malwêranî dîtine. Li serdemê rejîma berê bi caran xelkê herêmê li dijî dewletê şer kirine, lê her tim haine tepeser kirin.

Piştî bi deshilat gihîştina Komara İslâmî a Iranê û pêşkekş kirina xwestikên gelê Kurd ji aliyê PDK Iranê, mixabin Pawe yekem bajarê Kurdistanê bû ku bi ferma Xumeynî kete ber êrîşê û bo heyamê sê mehan xelkê herêmê û pêşmergeyên qehreman ê PDKî li hemberî Caş û Pasdarên xwînrêj ên Komara İslâmî de şer kirin û mixabin di encama şerê han de xelkekî zaf bi destê hêzên rejîma Iranê hatin şehîd kirin.

Kurdên Pawe di refêن Şoresa azadixwezî a gelê Kurd kesen wek :Ebdula Behramî, Hekîm Rizayî û bi sedan qehremanen din pêşkeşî doza azadîya Kurdistanê kirine.

Zimanê doh, îro û sibê



Zafer Berdestî

Bi pêşketina zanîn û teknolojiyê re hemû beş û pariyen jiyanê guherîne ku yek ji wan jî ziman e.

Ziman çendî li ser koka xwe dirêj/mezin dibe jî , û tev pêşketina zanîna însan ve şax vedide û diguhere. Her roj peyvîn nû dikevin nav ziman û bi "dem-mekan-jiyan"ê re hemaheng ew jî pêş dikeve. Di demên berê de, ji bilî îstisnayan peyvek beramberî heyînekî - belki dudu yan heta sisêyan-dihat bikaranîn û peyvîn hemwate û hevdeng kêm bûn. Lê îro êdî ne wisan e. Gelek ziman êdî di vî warî de guherîne, peyvek dikare were gelek wateyan an jî gelek wateyên cuda dikarin bi heman peyvî werin ifadekirin. Em gava li ferhengên kurdî, tirkî, erekî, îngilizî dinêrin ev rewş bi hêsanî tê dîtin.

Ev rewş ji ber keşf û îcadan, amûrên nû yên teknolojîk, navgînên ragihandinê, têkiliyên civakî û kesayetî dertê der û xwe nîşan dike. Însan, zimanê xwe li gorî van nûtî û pêşveçûnan amade dike, dixebeitîne û eyar dike. Jê re çawa hêsan, biçej û herikbar were zimanê xwe wisa lê tîne. Heta peyvek dikare ji maneya xwe ye eslî gelekî dûrkeve û êdî bi maneyên mecaz were naskirin. Mînakên van gelek in.

Bi ya min îro hînbûna zimanan ji do dijwartir e. Di vê derê de dijwartî ne di hînbûna zimanê zikmakî de, di hînbûna zimanê biyanî de bi taybetî jî di temenê mezin de ye. Herçiqas rê û rîbazên hînkirinê, bernâme û plansaziyên nû yên perwerdehiyê îro zêdetir riya hînbûnê vedikin jî îro barê hînbûnê girantir e. Lewre îro hem peyv zêdetir in hem jî maneyên wan zêdetir in. Lewma em êdî îro peyvekî bi carekî de na belki bi çend caran de paşê dikarin hîn bin. Ev jî barê me yî giran e.

Herwiha wiha bidome pêkan e ku sibê zimanê biyanî bi rehetî nikaribin werin hînbûn û însanek wekî berê nikaribe çend zimanan bi hev re hîn be. Her roj tiştên nû

wê derkevin û navê wan, peyvîn bi wan re eleqedar ew ê ziman firehtir bikin.

Lê însan dibe ku çareya vê bi amûrên teknolojîk bîne. Dikare amûrên wisa çêbike ku di saniyê de zimanekî wergerîne zimanekî din. Wekî mînak bi berçavkekî, bi saeteke serzend an jî bi telefonê yan jî bi amûrekî taybet di lezê de wergerê bike û însan ji vê zehmetê xilas bike. Însanek biaxive û wergera axaftina wî/ê li ser cama berçavka muxatabê wî yan jî li ser ekrama saeta muxatabê wî were xwendin.

Lê ev ne rîyeke mukemel e. Jixwe jiyana însanan bi amûr-hacetan ve hatiye dorgirtin dê zêdetir bipêçe û dê însan zêdetir hînî teraliyê bike. Ev ji aliyekî ve ji ber girtin e, kopî kişandin e lê însan jixwe ji eslê zêdetir hez kopyayan dike. Tenê dibe ku bi kerî pirzimaniyê were. Lewre rîbazeke wiha dê cihanê mecbûrî yekzimaniyê neke û zimanê din nekuje. Îro zimanê pêşketî berê xwe dane pêşerojê û diçin. Di her gaveke xwe de jî piçekî zêdetir mezin dibin, fireh dibin, giran dibin. Zimanê dînyayê do nêziktirê hev bûn îro ji hev dûr ketine, hejmara wan gihiştiye hezaran. Ji îro û pê ve xuya ye hinekên wan dê bimirin hinekên wan dê rawestin û hinekên wan jî dê pêşkevin û ji hev zêdetir dûrkevin. Kesênu ku dixwazin zimanê pêşketî hîn bin divê ji bîr nekin ku peyvîn hîndibin ne wek peyvîn berê ne.

Tiliyên destê sê ji birîndarên bûyera Şînawê hatin birrîn



dersxwanêñ keç yên din jî di haleta metirsîdar şewitîn, seba nexweşxaneya xirabiya rewşa bajarê Meşhedê de rûdana bûyerê ve cismî a 10 zarokêñ di bin çavdêriya heya niha, du bûyerê, pizîşk pizîşkan de ne. neçar man ku tiliyên destê sê ji wan bibirin.

Piştî derbazbûna pitir ji 40 rojî bi ser bûyera agir ketina xwendingeha gundê Şînawê a ser bi Pîranşarê ku têde 37

Hewceyî basê ye ku bi sedema kûrbûna birînê wan 10 zarokan, sê di li nexweşxaneya bajarê Tewrêzê de nawendî ya Gundê bajarê Îsfahanê û hatibûne ragirtin, ji Xamsan a ser bi yek jî, di emrazêñ kevin bajarê Kamyaranê jî nexweşxaneya mifah wergirtine, agir girt û keçek bi bajarê Tewrêzê û sê lewma digel vê navê Azîta Miradî, bi giranî birîndar bû.

Kaniya helbestan



BÊWAR BARÎ TEYFÛRÎ

Ey Kurd

**Qedera te derbaz dibe
bê wate,**

**Jiyanê da dilê te ne rehet
e,**

**Bi yekbûnê yekser rabe
raweste,**

**Hemberî zulm û înkara
bi çete.**

**Te tu dera qebûl nakir
bê warî,**

**Kuda diçî serbest nînî
stûxarı,**

**Her kîvî jî nayê pêş
çavan tucarî,**

**Vê rewşeda pêşeroj jî tim
tarî.**

**Tu alt bike vê cîhana bi
şiddet,**

**Ava bike jiyaneke bi
rûmet,**

**Tu alt bike vê jiyana bi
minet ,**

**Tu jî bijî jiyaneke bi
sîyanet.**

**Heya ku xelqperestî bê
niştmanî,**

Jiyanê da tê birizî erzanî,

**Pêş cîhanê bê fehmî û
nezanî,**

**Vê rewşê da gelo kêra
lazimî**

Ey Kurd



Beşeke Kurt ji şîretên Pêşewayê Kurdan Qazî Mihemed yekemîn serkomarê Kurdistanê

Yekîtî û hevgirtinê ï di navbera xwe ða biparêzin, karêñ ne layêq li hemberî hev nekin û ji hev re çavnebar(hesûd) nebin. Bi taybetî ï di berpirsyartî û xizmet kîrinê ðe.

Ji bo çend roj jiyana bêqîmetâ vê dinê xwe nefiroşin dujimin, çimkî dujimin dujimine û cihê bawerpêkirinê nîne.

Îxanetê li hev nekin, ne îxaneta siyasi û ne canî û malî û namûsî. Jiber ku îxanetkar li cem Xwedê û mirov sivik û tawanbar e. Îxanet bi ser rûyê îxanetkar ðe vedigere.

Hûn ji ðewama xebat û têkoşînê nesekinin, heya ku mîna hemî gelêñ ñin li jêr destê dujiminan rizgar ðibin. Malê ñinê ne tiştek e, ger welatekî we hebe, serbestiyek we hebe, mal û ãx û nîstimana we ya we bixwe be, wê ñemê hemû tiştekî we heye, hem mal, hem heyîti(sirwet), hem ñewlet û abantû(heysîyet) û nîstimana we jî yê hebe.

Ez bawer im ku tenê mafê Xwedê nebe, mafê kesekî ñin li ser min hebe, lê ger kesek li cem xwe wiha ðizane ku kêm heya zêde tiştekî wî li cem min heye, serwetekî pir zêde min li pey xwe hiştiye, bilâ here ji warisên min bixwaze û bistîne.

Heya hûn hev negirin, sernakevin. Zulum û zorê li hev nekin, jiber ku Xweda gelek zû mirovê zalim ji holê rađike û ji ñav dibe. Ev soza Xweda ye, û zû yan direng, zalim wê ji ñav here, û Xwedê wê toleya zordariyê ji wan bistîne.

Hêvîdarim hûn guhê xwe bidin min û Xwedê we bi ser dujiminan ðe bi ser bêxîne.

Xizmetkarê gel û nîstiman

Qazî Mihemed



20. Chiana village near Naqadeh, spring 1946

L-r (after guard with automatic weapon): Rahim Javanmard Qazi; Salahaddin Kazimov (Kakagha; USSR); Sayyid Ahmad Sayyid Taha (Iraq); Qazi Muhammad; Said Homayun; Muhammad Rasuli 'Dilshad'; Lt Khairullah (Iraq); Qolam Reza Khan (Qarapapagh tribe)



Qazi Mohammad shares a watermelon with Archie.

